

Agahî li ser Dibistana malê

Dibistanên li Norwêcê ji ber belavbûna vîrûsa koronayê girtî ne. Her çende dibistan girtî ne jî, hînbûn û perwerde berdewam e. Girtina dibistanan tê vê wateyê ku mamoste û desthilatdarên li Norwêcê divêt çareyeke din bibînin da ku ew xwendekaran perwerde bikin. Her çende xwendekar nikaribin herin dibistanê jî, pêwîste xwendekar li Norwêcê bê perwerde nemînin.

Dibistana malê çîye?

Dibistana malê tê wateya derswergirtinê li malê. Dibistan û mamoste berpirsyar in ku xwendekar perwerdê û dersan wergrin. Pêwîste têkiliya dibistanê û xwendekar bi hev re hebe da ku xwendekar zanibê wê çi bike û çawa bike.



Dibistana malê çawa pêk tê?

Her dibistanek û her mamosteyek cuda ji dibistan û mamosteyên din xwendekaran perwerde dikin û dersan didin. Hin mamoste bi xwendekaran re bi rêya programên cuda, bi rêya kompyûteran, tabletan an telefonan diaxivin. Dibe ku mamoste nikaribê her roj bi hemî xwendekaran re biaxivê, lê wê xwendekar li ser e-posteyê an jî bi awayekî din werin agahdarkirin ka karê/erkê dibistanê ê rojê çîye.


Çima hin kes diçin dibistanê her çende dibistan girtî ne jî?

Her çende dibistan ji piraniya xwendekaran re girtî ne jî, lê dîsa destûr heye hin zarokên biçûk herin dibistanê. Ji ber kû dêûbavên wan zarokan di karên krîtîk û girîng ên civakî de dixebitin. Divê dêûbav liser vê yekê bi dibistanê li hev werin.



Kengî xwendekar dikarin vegerin dibistanê?

Hikûmet biryar didê ka kengî dibistan wê dîsa bêne vekirin. Hikûmetê biryar daye ku xwendekarên herî biçûk dikarin pêşî dest bi dibistanê bikin. Dê rêzîkname werê çêkirin ka çawa xwendekar dikarin digel hev bin di polên xwe de, di bêhnvedanê de û li her deverên din ên ku perwerde li wan tê kirin, wek mînak dibistana derve. Rêzîk dê rêgirbin û nehêlên ku karmend û xwendekar hev vedin. Dibistan dê dêûbavan li ser kengî û çawa xwendekar wê dîsa bikaribin vegerin dibistanê agahdar bike.



Dema ku ew her roj hevdû nebînin, dê xwendekar çawa bikaribin bi dibistanê û hevalên xwe re têkildar bin?

Eger xwendekar hevdû weke caran nebînin jî, ew dikarin amûrên dijîtal bikarbînin da ku bi hev re di têkiliyê de bin. Ji ber ku keyfxweşîye ku xwendekar hevdû bibînin, her çende dibistan girtî bin jî . Gelek giring e ku xwendekar amade bibin dema ku mamoste li ser telefonan, kompyûteran an tabetan dersan bidê. Ev jî jda ku mamoste karibê xwendekara bişopîne û ji wan re bibê alîkar.

Li ser vebûna dibistanan a pile bi pile agahiyên zêdetir bi gelek zimanan li ser malpera helsenorge.no bixwînin.

<https://helsenorge.no/koronavirus/informasjon-pa-andre-sprak>